



## Navenda Hevkariyê a Partiyên Kurdistanana Îranê nameyek ji UNESCO'yê re şand

**N**avenda Hevkariyê a Partiyên Kurdistanana Îranê di nameyekê de ji saziya UNESCO'yê xwest çavdêriyeke çalakane li ser riftar û siyasetên wêranker ên rêjîma Îranê bikin û hewl bidin givaşê bixin ser rejîmê da ku bi yasa û pîrensîpên vê saziyê pabend be.

Daxuyanî wiha ye;

Birêz saziya Perwerde, Zanist, û Çandî a Neteweyên Yekbûyî "UNESCO"

Silav û rêz

Em weke partî û aliyên siyasî ên beşdar di Navenda Hevkariyê a Partiyên Kurdistanana Îranê de bi helkefta 21'ê Şibatê roja Cîhanî a Zimanê Dayikê, bi pêwîst dizanin we ji rewşa nebaş a neteweyên zulmdîtî li Îranê di warê zimanê dayikê de haydar bikin û ji we bixwazin weke organeke berpirsyar di vê derbarê de givaşê bixin ser Komara Îslamî a Îranê daku dawiyê li zulm û tepisandinê bînin ku ji ber siyasetên vê rejîmê, çand, nasname û zimanê dayikê rastî wan serkuan hatiye.

Îran welatekî pirçand û pirnetewe ye ku her yek ji neteweyên vî welatî xwediyên ziman û nasnameya cuda a xwe ne. Li gor yasayên navnetewî ên pêwendîdarî mafên mirovan, mafê xelkê ye ku bi zimanê dayikê bixwînin, çand û zimanê xwe biparêzin û berfireh bikin. Weke ku hûn dizanin, ev maf di daxuyaniya cîhanî a mafên ziman, carnameya Zimanê Dayikê a UNESCO'yê, peymannameya Navnetewî a Mafên Sivîl û Siyasî ên Neteweyên Yekbûyî û Konvansiyona Mafên Zarokan de jî hatiye. Komara Îslamî jî hemû ev peymanname îmze kirine û di wan saziyan de jî endam e ku yek ji wan UNESCO ye.

Li gor xala neh a yasaya sivîl li Îranê, divê weke yasayên ku ji aliyê Meclîsa Îslamî a Îranê ve hatine pejirandin, kar bi wan yasayan jî bê kirin.

Lê tevî ev berpirsyaretiya ku îmzekirina wan belgenamayan davêje ser milên Komara Îslamî, ti gavek ji bo bicihkirina wan yasayan nehavêtiye. Li gor esla 15'ê a yasaya Bingehîn a Rejîmê, zimanê Farsî, weke take zimanê fermî ê welat tê binavkirin. Herwisa pîrsa xwendin bi zimanê dayikê ê neteweyên ne Fars, ku zêdetirî nîva heşimeta Îranê lixwe digire, weke gefek li ser ewlehiya niştimanî û yekperçetiya welat binav dike û amade nîne îtirafê bi mafên zimanî ên wan neteweyan bike ku yek ji wan jî neteweya Kurd li Kurdistanana Îranê ye. Di vê derbarê de rejîma niha a Îranê siyasetên rejîma Pehlewî berdewam dike û asîmilasyona zimanî, înkarkirin û bêrêzîkirin bi çand û nasnameya beşeke zaf ji neteweyên Îranê, guhertina demografîyê û jinavbirina zimanê Kurdî û zimanên neteweyên din ên bindest bi qezenca zimanê neteweya serdest girtiye ber xwe. Semyanên welat jî, ji bo jinavbirina çand û nasnameya wan neteweyan bi kar tîne. Çalakvanên çandî û zimanî ên Kurd bi awayekî xwebexşane hewl didin dewreyên perwerdeya zimanê dayikê ji bo ciwanên vê neteweya danên, lê ji aliyê saziyên hikûmetê ve rastî astengiyên cuda tên û hikûmet, mohra tawanên emniyetî li çalakiyên wan ên mafxwazî dide.

Em ku weke partî û aliyên siyasî ên beşdar di Navenda Hevkariyê a Partiyên Kurdistanana Îranê de ku ji bo dabînkirina mafên siyasî û zimanî ên neteweya zulmdîtî a Kurd li Kurdistanana Îranê xebatê dikin, ji we dixwazin bi rengekî çalakane çavdêriya riftar û siyasetên wêranker ên rêjîma Îranê di vê derbarê de bikin û hewl bidin givaşê bixin ser rejîmê daku yasa û pîrensîpên saziya we û ên din ku rejîmê jî îmze kirine, bi cî bike û bi kiryarên xwe, dawiyê li zulm û tepisandinê li dijî çand û zimanê neteweya Kurd bîne.

Digel rêz û hurmetên me

Navenda Hevkariyê a Partiyên Kurdistanana Îranê



## Pirtûka feylesofê Fransî ya derbarê Kurdan de hat belavkirin

**P**irtûka Feylesofê Fransî Bernard Henry Levy a derbarê bûyerên 16ê Cotmehê li Kerkûkê û Kurdan de bi navê *The Empire and the Five Kings (Împaratorî û Pênc Kral)* hat belavkirin.

Welatiya Amerîkî ya bi navê Ceyty Hillman ji Rûdawê re behsa bûyerên 16ê Cotmehê kir û derbarê pirtûka Fransî Bernard Henry Levy de jî wiha got: "Ez şaş mam li hemberî ku cîhan bî wî awayî piştî xwe dane Kurdan û ew bi tenê hiştine. Berî ez pirtûka Fransî Bernard Henry Levy bixwînim agahiyên min li ser vê yekê nebûn."

Bernard Henry Levy di pirtûka xwe de bûyera 16ê Cotmehê wek bûyera herî bi bandor nîşan daye.

Levy di pirtûka xwe dibêje ku cihana azad û demokratîk jêr gefên Çîn, Rûsya, Îran, Tîrkiye û hêzên tundraw de ne û Amerîka û welatên Ewropayê li hemberî wê yekê xwe bêdeng dikin. Levy wek bergiya li hemberî gefan dibêje ku ji bo Kurdan azadî amûrek girîng e.

**Pirsa Kurdên Sûriyê di navbera helwesta Amerîka û Rûsyayê de**



**Ebdul'ezîz Qasim**

Piştî biryara Serokê Amerîka Donald Trump di meha çile de li ser vekîşîna hêzên Amerîkayê ji Sûriyê, roj bi roj gefên Tirkîyê li ser pêkanîna oparesyoneke leşkerî bi beşdariya komên çeteyên ereban yên terorîst li ser herêmên kurdan li rojhilatê Çemê Firatê zêdetir dibûn, û mîletê kurd careke din ket di bin tirseke dijwar de nemaze piştî dagîrkirina Efrînê, gelê kurd tûşî ziyaneke mezin bû, ku navçeyê Efrînê bi timamî hat wêran û talankirin û niha bi erebkirin û guhertina demografîk li seranserê navçeyê Efrînê destpê kiriye.

Dagîrkirina Efrînê li ber çavê hemû dewletên dinyayê û bi taybetî Rûsya û Amerîka û Ewropa hat pêkanîn, û mixabin; Tirkîya serkeftineke leşkerî û siyasî ya mezin bidest xist !

Lê îro xuya dibe ku sibaroja herêma rojhilata Çemê Firatê, dê ne wek çarenivîsa Efrînê be! Û herwisa ku Amerîka û Rûsya û Dewletên Ewropayê û heta Herêma kurdistanê bêdeng namînin li hember her dagîrkariyê nû



ya dewleta Tirkîyê li ser xaka kurdistanê Sûriyê.

Îro daxuyaniyên Rûsya û Amerîka li ser mafên mîletê kurd li Sûriyê pozetîv û erênî ne, tevî ku Rûsya dixwaze ku mafên kurdan bi riya diyalogê ligel Şamê misoger bibin, ku ev yek xuya ye ji daxuyaniyên rayedarên Moskowê ku çend caran mafê otonomî bo kurdan aniye ziman, û Amerîka dixwaze mafên mîletê kurd bi riyên din û heta radeyekî bi rêkeftinekî di navbera kurd û kurdan de misoger bike, û derbarê vê yekê hewldanên Herêma kurdistanê û bi taybetî yên Serok Masûd Barzanî giraniya xwe heye û niha jî nûçe hene li ser hewldanên Amerîka ji bo derbaskirina hêza "Pêşmerge Rêj" li deverên sînorî û pêkanîna rêveberiyê hevbeş di navbera

hêzên Sûriya demokratîk û ENKSê de, bi dûrkirina pkk ji rêveberiya deverên kurdan.

Diyar e ku vekîşîna Amerîka ji Sûriyê û ji kurdistanê Sûriyê bi rêkeftin ligel Rûsya tê pêkanîn, û dibe ku ev nêzîkbûna helwesta wan ji pirsê mîletê kurd di çarçoveya rêkeftineke berfireh de li ser tevaya Sûriyê ji bo rizgarkirina wê ji hejmongerî û baladestîya Tirkîya û Îranê û derbarê vê yekê hin hewldanên dewletên ereban mîna Erebiyê, Si'udî û Urdin û Dubey hene ji bo derxistina çeteyên Îranê û hizibullah û çeteyên Tirkîyê ji Sûriyê bi temamî, bi taybetî ku Rûsya li hember oparesyonên Îsraîlê li dijî baregehên serbazî yên Îranê li Şamê bêdeng bû û herwiha berdevkê kirêmlin got ku Îran ne hevpeymanê Rûsyayê ye.

Dîsa xuyaye ku Amerîka ji bo rêkeftinekî ligel Tirkîya amade nîne, lewra Tirkîyê tûşî bêzariyê mezin bûye û niha dixwaze bi riya têkiliyan ligel hikûmeta Sûriyê, bi riya rêkeftina Edenê ya ewlekarî derbas bibe, lê daxuyaniyên dawiyê yên serokê Sûriyê Bişar Esed li dijî her rêkeftinekê di navbera Sûriya û Tirkîya de hat, û tevî ku çarenivîsa navçeyê û Sûriyê ji dest Esed û Erdogan derketiye, û niha dîr nîne ku Tirkîya bi naçerî ji Idlibê derkeve û bi heman şeweyî dê bi neçarî ji Efrînê jî derkeve.

Tirkîya û herwisa Îran jî di nav axa Sûriyê de, dê tûşî şikestineke mezin bibin herger ev nêzîkbûna Amerîka û Rûsya ji encama rêkeftin û têgihiştineke hevbeş be.

»»» Doma R:2

Di beşek pirtûka xwe de nivîskarê Fransî destnîşan dike ku serxwebûna Kurdistanê di berjewendiyên welatên Rojavayî de ye.

Dîroknasê navdar ê Brîtanî Simon Schama jî dibêje: "Eger em niha sê krîzên mezin ên cîhanê hejmerin:

Yekem; mirina hêdî ya jingeha cîhana me. Duyem; di welatên pêşketî û yên nû pêşketî de asta cîyawaziya perwerde û aboriyê. Sêyem; kêsên ku pirrengiya civakê qebûl nakin bi postalên xwe, pêl li serê wek mîletê Kurd dikin."

Levy bûyerên 16ê Cotmehê wek destguhertina Berlînê û Varşowayê bi nav dike û dibêje: "Bûyerên li Kerkûkê rû dane, ji bo Kurdan karesateke mirovahî ye, lê ji bo welatên Rojavayî jî karesateke ehleqî ye. Dibe 16ê Cotmehê dubare bibe. Donald Trump di bersiva pîresekê de dibêje 'Ez ji Kurdan hez dikim.' Lê di siyasî de hezkirina bê kiryar bê wate ye."

Nivîskarê "Împaratorî û Pênc Kral" herwiha şanoyek jî amade kiriye û biryar e ew şano li 25 welatên Ewropa were pêşandan.

## Şukrî kevir xist!!!



Bûbê Eser

Di zîndana Diyarbekirê de ya bi navê 5 nolî de ku piştî darbeya 12 Îlona 1980`î li Tirkîyê û li Bakurê Kurdistanê pêk hatibû. Vê darbeya leşkerî bêtir berê xwe dabû şoreşger û welatparêzên Kurd û ji bona wan bikin Tirkê baş, ew hatibû vekirinê.

Vê darbeya leşkerî agir bi welatê me Kurdistanê şêrn xistibû, û karê wan tenê bûbû girtin û êşkencekirina şoreşger û welatparêzên Kurd. Ji ber vê bû tu roj nebû ku bi dehan, bi sedan ciwanên Kurd, gundiyên Kurd û karkerên Kurd negirtina, êşkence nekirina û nexistina zîndanên xwe.

Ji ber zêde girtina Kurdan ya piştî wê darbeyê, êdî cih di zîndanên li Diyarbekirê hebûn, nema bû. Ji ber vê tunebûnê wan zîndaneke nû, mezin û li gor daxwaza ku wê bikaribin êşkenceyên xwe bikin, vekiribûn.

Ji ber ku êdî cih di zîndanên de nema bû. Lewra karbidestên Tirkan berî ku wê ew girtîgeh biqede hema destpêkirin û ciwanên Kurdan birin wê girtîgehê. Wir kirin cihê lêdan, êşkence û her cûreyên êşkenceyên nedîtî. Yê vir nedîtîbin, mirov çiqasî behsa wê û êşkenceyên têde bike jî, mirov nikare hemiyên bêje an binivîsîne. Mirov nikare wan êşkenceyên wir bi kesên wir nedîtîne bide qebûlkirinê, ka çi dianîn serê ciwanên Kurd yê girtiyên wê zîndanê.

Ya rastî her kesên ku di wê zîndanê de bûn, dixwestin rojekê berî rojekê bimrin da ku ji wan êşkenceyan azad bibin.



De bifikirin ku mirovek, însaneke û girtiyek çawa daxwaza mirinê dikir. Ji ber vê zehmet e ku mirov kiryar û bûyerên wir bi awayekî vekirî bêje û binivîsîne. Heger bê gotin û nivîsandin jî dê zêde kes bawer nekin ku ewqasî destdirêjî, lêdan û êşkence li xortên Kurdan dikirin.

Ji bona mirov li wir kêr êşkenceyan bibîne, carna mirov li hacên xwe ji êşkencan azad bike digeriyan. Hin dîtînen ji wan, alîkarî dikirin ku mirov kêr êşkenceyan bibîne.

Şukriyê hevalê me ku ji herêma Mêrdînê bû. Ew bi xwe mamoste bû, lê şikayet li wî kiribûn (navê wî dabûn) ku wî li dibistanê dersên Kurdî jî dida, lewra hatibû girtin û gelek zêde êşkence lê dikirin.

Berî girtinê, di gurçika Şukriyê me de kevir hebûn. Dema li zîndanê zêde êşkence lê dikirin, rojekê wî kevirê xist û ew kevir bi awayekî rêk û pêk girt nav destên xwe, û li nava paçekê de parast, da ku di dema lêdan û êşkencan de ji leşkeran re bêje:

-Komûtanê min, aha ev kevir ji gurca min ket, loma ez nikarim zêde derkevim derve, û meşa leşkrî bikim.

Bi xistina vî kevirê ji gurcika xwe Şukriyê me hinekî ji lêdanê azad bûbû, û ew zêde derne-dixistin meşa ku bi me didan kirinê.

Werhasil mesela xistina kevirê Şukriyê me dût û dirêj e. Ew kevir ji wî re bû bû sedema ku wî bi qasî me lêdan û êşkence nedidît.

Me zanîbû ku êdî tu êşa gurçika wî nemabû, lê wî ew kevir her diparast û bi saya wî kevirê ji lêdana zêde û perwerdeya ku em bi rêya meşê fêr dikirin, azad bû bû.

Rojekê polisên zebeniyên siyasî yê şuibeya yekê ez, şukrî û çend heval ji girtîgehê birin wir, da ku ji nû ve me êşkence bikin, da ku tiştên em dizanin an polis dixwazin bidin wan.

Çawa polis em derxistin derve, da ku bixin nava tirombêla xwe de, hema yekser şukriyê me kire ay ay, û nalîneke bê xwedan dikir. Polîsan pirsîn çi bi te hatiye, wî got:

-Aha binêrin komîtanê min, ev kevir ji gurçika min derket, loma diêşe û êşa wê xeter e. Polîsan got:

-Xem nake, deme em xwe bigihêjin şuibê, emê nexweşiya te çare bikin.

Belê me xwe gihand şuibê, em xistin hundir û di vir de çavên me yê giradayî vekirin. Lê her aya aya Sukrî bû. Me zanîbû tu tiştêkî wî nemaye, lê wî dixwest weke wê zîndanê xwe ji êşkencan azad bike. Lê bê fêde bû. Ji ber ku polis ne weke gardiyanên wê zîndanê nezan bûn...

Belê di her tengasiyekê de, mirov li rêya xilasîyê digere, û carna ew dihate dîtî. Ji ber gardiyan ango zebeniyên wê zîndanê hemî nexwenda û nezan bûn. Ji bona aferîmekê an jî çend roj bêhnvedanekê, wan êşkenceyên nedîtî dianîn serê me.

Ji ber ku em jî kesên xwenda û zana bûn, carna bi sedema ketina kevirêkî ji gurçikê, an jî bi sedema lêdanekê, me xwe ji zêde êşkencan azad dikir, an kêr didît.

Zîndana Diyarbekirê ya bi navê 5 nolî ya ku karbidestên Tirkan dixwest xortên Kurdan yê di wê zîndanê de bûn, bikin Tirkên baş, sedema hemî lêdan û êşkencayan ji ber vê bû.

Lê tu yek ji wan şoreşger û welatparêzan nebûn Tirkên baş, û dema ji wê zîndanê hatin azadkirin, piraniya wan bûne rêvebir, bûne kadirên rêxistina xwe da ku welatê xwe azad bikin.

Tiştên di wê zîndanê de dihat kirin, di kampa Hîtler de jî, nedihatina kirin. Tiştên li wir dianîn serê me ciwanên Kurdan, li vê cihanê li tu dereke din mirov nikare bibîne.

Heta dinya hebe, em behsa wê zîndanê û tiştên dianîn serê me ciwanên Kurd bêjin û binivîsînin dawî lê nayê. Lê heta ji dest wan kesên di wir de mane bihê, divê tiştên wir bêjin û binivîsînin...

## Îranê Hewcehî Bi Serhildanek Nû Heye



**Eli Jon Lake**

40 sal beriya niha, di çend mehên beriya serkevtina şoreşa gelê Îranê, Ayetulah Xomeynî, gellek soz dan xelkê. Wî bas ji rêzgirtin ji mafê kêmaniyan, demokrasî û yeksanî di navbera jin û mêr de kir.

Rewşenbîrên Ewrûpî yên weke fîlosofê Fransî, “Michel Foucault” wê demê pêşwazî ji nerîna Xomeynî kir. Li Îranê, girûpên liberal û komunîst bi hez ve tevî alîgirên Xomeynî bûn, bo hilweşandina rejîma fasid ya Şah. Xomeynî wê demê, rast ew tişt digotin ku xelkê Îranê li benda bihîstina wan de bûn û jêre xebat dikirin.

Direvên Meslehetî:

Lê bi awayekî din, wî direv ligel xelkê xwe dîkr. Gorî Ebdulhesen Benî-seder, yekemîn Serkomarê Îranê piştî serhildanê, Xomeynî li ser qîsên xwe ranewesta û Xomeynî hemû ew sozên ku beriya serhildanê dabûn xelkê, bi direvên meslehetî nav birin.

Hikûmeta tekrewan:

Rast piştî vê ku Xomeynî xwe weke rêberê Komara Îslamî da nasîn, pişt li piraniya sozên ku dabûn xelkê kir. Pirofesor Mîsaq Parsa di pirtûka xwe ya bi navê “demokrasî li Îranê”, bas ji vê yekê dike û dibêje ku çima şoreşa Îranê ser negirt û rêka serkevtina wê çibû. Pirofesor Mîsaq Parsa hikûmeta xomeynî bi hikûmetek tekrew û dîktator dide nasîn ku soza ku bo demokrasîyê dabû bi tewahî bin pê kir.

Kevirbarankirina Jinan:

Melayên Îranê û alîgirên wan gellek kar hebûn ku diba encam bidana. Wan vexarîna elkohe,

### Îran, piştî 40 salan ji serkevtina şoreşê, hêj dinale

guhdana mûzîkên bi navûdeng li radio û televîzyonan û gerandina seyana di nav parkan de qedexa kir.

Wan herwiha kempeyên bo sizadana xelkê di cihên giştî de ava kir, û dest bi kevirbarankirina wan jinan kirin, ku derveyî şerî`eta Îslamê ligel kesek din tîkêliyên cînsî hebûne. Hewiha şelaqdana mêran di cihên giştî de destkevtên şoreşa Îslamî li Îranê bûn.

Kuştina 40 hezar Însanan:

Di sala 1988-an de zêdeyî 40 hezar kes ji neyarên rejîmê ji aliyê melyên Îranê ve hatin daliqandin.

Gorî rojnamevanên bê sînora di navbera salên 1979-2009-an de

aliyê kêm 860 roj-namevan ji aliyê rejîmê ve hatine destbiserkirin, zîndanî kirin û kuştin.

Îtrafên televîzyonî:

Îro rojê jî TV-yên dewletî dest bi wergirtina îtrafan ji xelkê dike. Havîna derbazbûyî “Maêdêh Hojabirî”, jîmlastîkvan, li hember televîzyona dewletî bi zorî hat mecbûrkirin daku îtraf bi poşmaniya xwe bikeê derheq belavkirin parçe vîdyoyek ji dansa xwe bê hebûna hicabê li “instagram”ê.

Heta Îraniyên dervey welat ji tundûtîjî û cînyetên han dîr neman. Rejîma Îranê di asta cîhanî de bi şandina girûpên terorê bi derveyî welat bo terorkirina neyarên xwe hatiye nasîn. Bo mînak Şapûr Bextiyar, Serokwezîrê berê yê Îranê, ku bo heyamek kurt hikûmetek reformîst di mehên dawî yên rejîma Şah de ava kir, bi kêran li Fransê li apartimana xwe de li sala 1991`an de hate terorkirin.

Tîrsa Rejîmê Ji Mesîh Elînejad Heftiya derbazbûyî berpirsê dezgeha dad ya Îranê ragihand ku ew wê dest bi lêkolînê bikin li ser Mesîh ELînejad, rojnamevanê rûniştîyê Amerîkayê. Ji ber ku heyamek berî niha Elînejad ligel Wezîrê Karûbarên Derve yê Amerîkayê, “Mike Pompeo” rûniştinek hebû. Elînejad bi vê tawanê hatiye gunehbarkirin ku jinên Îranê han dide ku destmalên serê xwe fire bidin, û li filma firedana destmala xwe li ser “social media” belav bikin.

Li demekê ku dewleta Îranê ku ji aliyê Xomeynî ve hatiye avakirin, dest daye îşkencekirinan welatiyên xwe, berpirsên vê rejîmê roj bi roj zengintir dibin. Lewma îro-

Cewad Zerîf, Wezîrê Derve yê Komara Îslamî ya Îranê hêj dema ku ligel medyayên biyanî hevpevînê dike, bi awayekî xwe nîşan dide ku nûnerê welatek demokratîk e.

Gellek welatên Ewrûpî dest bi piştevaniya Xomeynî kirin, heta niha jî Yekitya Ewrûpa û “Jan Kerî”, Wezîrê Derve yê berê yê Amerîkayê, hewil didin daku rêkevtina navîkî ya sala 2015`an ku çalakîyên etomî yên Îranê sînordar dike, biparêzin. Ew bawer dikin ku rejîma Îranê soz daye ku hewla çêkirina çekên navîkî nede, li halekê de ku piraniya wan rêkevtinan kêmtir ji 15 salên din hitbara xwe ji dest didin.



rojê tu cudahiyek di navbera rejîma Îslamiya Îranê û rejîma fasid ya Şah ku 40 salan beriya niha tîkê çû, tune. Spaha Pasdaran rejîma Îranê rast weke bandek cînyetkar kar dike, bi rêya kontrolkirina beşek zêde ji dahata xelkê Îranê. Li gorî lêkolîna “Reuters”ê di sala 2013-an de , rêberê niha yê Komara Îslamiya Îranê, Ayetulah Xamineyî, xwediyê dahat û pereyê zaf e ku digîje 10 milyar Dolaran. Ew pereye hemû perê xelkê Îranê ye.

Tu kesek aqil bawer nake ku li Îranê de demokrasî heye. Lê hêj li hinek welatên Ewrûpî û Amerîka, hinek kes bawer dikin ku belê hêj li Îranê demokrasî heye, û rikeberî heye di navbera du girûpên reformîst û muhafîzekar yên Îranê de.

Nûçeya xweş eva ye ku bi milyonan ji xelkê Îranê êdî qet gotinên berpirsên vê rejîmê bawer nakin. Ewa 40 sal e ku xelkê Îranê rûbirûyê tehqîr, teror li Îranê dibin û tu azadiyek ji wan re tune. Karê herî kêm ku Amerîka û Ewrûpa dikarin bikin ewaye ku piştevaniya xebata xelkê Îranê bo serhildanek demokratîk li Îranê de bikin.

**“Eli Jon Lake”, rojnamevanê Amerîkî ye ku weke stûnnivîs ji bo dezgeha ragihandina Bloomberg View kar dike. Wî herwiha berê weke raportvan di beşa ewlehiya netewî di rojnameya The Daily Beast and Newsweek kar kiriye.**

W: Hemîd Muxtarî

## Rojnameya Kurdî û hizrên Simkoyê Şikak



**Kakşar Oremar**

Xizmetên Çandî û Navroka Rûpelên Rojnameya Kurd

Di 25 salên jîyana siyasî ya serdema şoreş û desthilatdariya Simkoyê Şika de, em rastî hinek karên wî yên girîng tî ku hingî cîbicîkirin û pêkanîna wan ne hêsan bû. Bihayê wan karên han bi li ber çavgirtina îmkân madî û derfên civakî-siyasî ên kêr û taybetî pir bilinde. Sala 1912-13an bi hevkarîya Ebdulrezaq Bedirxan (1864-1918) kovara bi navê KURDISTAN tê weşandin. Li bajarê Xoyê komeleya bi navê GIHANDANIYÊ tê çêkirin ku tê de armanc pêgihanandin û perwerdekirina zarok û ciwanên Kurd e. Dîsa li sala 1916an, xwendengeheke Kurdî ji zarokên Kurd re tê vekirin û Simko bi hemû hêza xwe ya siyasî û madî piştî wê pêngava mezin jî digire.

Di warê aborî de, malîyat ji bazirgan û dewlemendên herêma desthilatdarîyê tê standin û ew bi hemû hêza xwe dixwaze ku gel ji hikûmdarîya wî razî û memnûn bin. Helbet tevahîya van kar û xebatên weha divê li gor derfetên wê serdemê bêne nixandin.

Rojnameya “Kurd”, peyvdara desthilatdarîya Simkoyê Şikak bû ku bi texmînî tenê 6-7 hejmar jê derketine. Rûpelên wê dêr bi dêr xwedî naverokeke pir dewlemend bû û peyamên siyasî-civakî yên wê serdemê tê de cî digirtin.

Bi xwendin û şirovekirina wan gotar û peyamên wê, rêyeke tijî ronahî li ber me vedibe ku em baştir bîr û ramanên Simkoyê Şikak û armancên şoreşa wî binasin. Armancên wî çî bûn û çîma serî hildabû li dijî desthilatdarên nelayîq û sistema desthilatdar ku li Îran û Kurdis-



tanê xwedî berpisrên sitemkar û xerabker bû. Wî çend caran bi bîra wan anîbû ku her tişt: “Ne bi zorê ye, belkî bi dorê ye!” Û êdî dewrana wan jî divê bê dawîya xwe. Weha jî kir û di dema çend salan de nivê axa Rojhilatê Kurdistanê azad kir. Simko wekî bazekî, nêçîra koremaran dikir; ew koremarên ku jehra xwe bi ser jiyana xelkê de belav kiribûn.

Kesên wekî Mihemed Temedon îdia dikin ku navê rojnameya serdema Simko berê: “Rojî Kurd û Şewî Ecem” bû, lê logoya hejmara yekem di destê me de ye ku roja pêncşemê, 12ê meha Şewala sala 1340î ya Hicrî-Qemerî (08.06.1922 a zayînî) li Urmîyê hatiye weşandin. Rojname heftane bû û tevî ku hejmara duduyan hîn peyda nebûbû, lê divê ew hejmar jî di 15.06. 1922yan de hatibe weşandin. Hejmara sisêyan jî, ku hemû rûpelên wê di destê me de hene, roja duşemê, 28ê Zulqeydeya sala 1340î (23.07. 1922) an hatiye weşandin. Werin em 6 rûpelên wê rojnameyê vedin ka çî tê de ye:

Rojname heftane û di nava du xêzan de bi Kurdîya naverast û bi tîpên Erebi weha li ser hatiye nivîsandin:

“Rojnameke siyasî, edebî, exbarî, sermeqale tercume dekirê be Farisî denûsê Kurdek bo hemû Kurdan”.

Li alîyê rastê yê rojnameyê jî weha hatiye nivîsandin:

“Çîgey îdare Wirmê Çapxaney Xîret Modîr: Mihemed Turcanî Meqalatek menfeitî Kurdan tê da bê werdegîrê. Carê le her hefte da yekek çap dekirê

12 mang Şîwal 1340.”

Li vir, xala herî balkêş ew e ku birêveberên rojnameyê bi awayekî zelal didin diyarkirin ku tenê ew gotar tîne belavkirin ku di ber berjewendîya Kurdan de bin.

Di naverasta rûpela yekê yê rojnameyê de, sûreta Al Umran, ayeta 103an hatiye nivîsandin: “We i`tesimû bi heblil-lah cemîen we la teferreqû واعتصموا بحبل الله جميعاً ولا تفرقوا” (1)

Li jêr wê ayetê jî du destên hevgerî hene ku wekî sembola yekîti û tifaqê hatine diyarkirin. Di nivê rûpela yekê yê rojnameyê de jî navê rojnameyê “Kurd” hatiye nivîsandin.

Li alîyê çepê jî weha hatiye nivîsandin:

“Heqê rojnamê pêşekî werdigîrê.”

Bihayê rojnamê yê nav û derveyî welat jî weha hatiye diyarkirin:

” Daxile: Salek 50 Qiran. Şeş mang 27 Qiran  
Xarice: Salek 60 Qiran. Şeş mang 35 Qiran  
Qîmetî yek nusxe deh Şahî

Qîmetî îlanan her dêrî du Qiran.

Nêrîn û daxwazên Simkoyê Şikak

Tevî ku ew hê ciwan û li pey kuştina bab û birayê xwe li herêma bûye kesekî xwedî karîzma, lê mirovekî dûrbîn û xwedî ramanên Kurdayetîyê. Simko xwedî armancên pîroz û dîrokî bû. Ji hemû kar û xebatên çandî, rewşnebîrî û siyasî yên ku di serdema serîhildana Simko de li Kurdistanê hatine kirin, mirov hingî dizane ka çîma ji hêla desthilatdar û Îranîyên nasyonalîst ve ew qas rik û kîn li hemberî Simko hebû ku hîn jî ew dijberî bi dawî nebûne. Heta rewşnebîrên wê serdemê jî tevî ku baş dizanîn Riza Şahê Pehlewî dê welêt ber bi sistemeke dîktator ve bibe, dîsa jî xwe ji vegotin û nivîsandina rûdanên rast vedidizin û bi bêşermî li dijî şoreşgerên Kurd û armancên wan ên siyasî dinivîsin. Rojnameya Kurd wekî yekemîn rojnameya Kurdî ya Rojhilatê Kurdistanê, xwedî hinek taybetmendiyên berbiçav e:

1. Bi du zimanan, Kurdî û Farisî, hatiye weşandin.

2. Bi du zaravayên Kurdî, anku Kurmançî û Soranî, hatiye amadekirin û weşandin.

3. Di rojnameyê de, ji hêla liderên şoreşê ve, rêbaz û armancên şoreşa Kurdistanê hatine şirovekirin.

## Nerîna Lîderan



Zerîf:

“Renge Amerîkayê xirapkarî kiribe, lewra mahwareya me nek-arî armanca xwe bipêke”.



Brian H. Hook: :

“Komara Îslamiya Îranê dijminê hevpar ê welatên navçeyê ye”.



Kwîm Tora:

“Tenê tawana berpîrsên me ew e ku rapîrsî encam dane”.



Îlham Ehmed:

“Em dewleteke yek partî qebûl nakin”.

## Werşo û destpêkek!



Siyaset, gef û metirsiyên Komara Îslamî ya Îranê li asta derekî û navxweyî de gihane dereceyekê ku êdî civaka cihanî nekare çavên xwe li hember de biniqîne û bibe temaşevan.

Çûnkî teror, tepeserî, hovêtî û neewlekirin û ... hwd, piştî 40 salan ji desthilatdariyê, bûne nasname û kakila rastîn ya vê rejîmê. Evane û zaf reftarên kirêt ên rejîmê bûne hêvinê lidarxistina konferansa navnetewî a “Werşo” bi beşdariya pitir ji 60 welatên cihanê li jêr navnîşana “Evlehî û aşî bo rojhilata Navîn” de.

Bêguman merem ew gef û metirsî ne ku rejîma melayan li ser ewlehiya deverê pêk anîye, û ew yek jî, ji zimanê Mayk Pompêo, wezîrê karê derve yê Amerîkayê di dawiya konferansê de hat ragihandin ku “Beşdarên konferansê hevdeng bûn ku rejîma Îslamî ya Îranê mezintirîn gef

e”. Lewma komcivîna han eger hilgîrê peyama herifandina rejîmê jî nebe, lê nîşan ji givaşên pitir in bo ser rejîmê û wê ji niha şûnde li siyaset û reftarên dijî rejîmê de, reng vedin.

Ji xwe dîdara fermî ya wezîrên çend welatên Erebbî tevî Natan-yaho û nizîkbûna wan bi Îsraîlê re, encama wan gef û destwerdanên deverî ên rejîma Îranê bû, ku bûye yek ji deskevtên mezin ên vê konferansê û wusa dixuye ku hevalbendiyek ranegihandî ya Amerîka, Îsraîl û wan welatên Erebbî li dijî rejîma Îranê be li jêr navê “Natoya Erebbî” de pêk bê.

Rejîma Îranê herçend bi awayên cur bi cur radigehand ku ew konferans serkevtî nabe, lê eva ku bo yekem car ew qas welat li dewra hev bicivin û bas ji destewerdana vê rejîmê di nava karûbarên herêmê û metirsîdarbûna vê bikin, gellek girîng e. Ew yek her wisa dikare wekî pêngava destpêkê

ya bi vî rengî be li dijî rejîmê. jiber ku hekî rejîma teslîm nebe, wisa dixuye konferansê weha bi awayekî berfirehtir û bi amadebûna opozisyona rejîma Îranê jî bi rê ve herin.

Ji aliyekî din ve ew konferans herçend ku bona berbirûbûna digel metirsiyên rejîma Îranê bi rê ve diçe, di heman demê de, dikare bibe sedema cîbucîbûna xerîteya giştî ya Amerîkayê jî. Ew hevalbendî dikare di pêngava yekem de rola Rûsiyê di herêm de kêm bike, herwisa dikare bibe sedema zêdetir nêzîkbûna welatên herêmê bi Îsraîlê. Bêguman hekî siyasî etên rejîma Îranê ên dijîgelîyane nebûna, renga zehmet bû ku ew yek ser girtiba û nêzîkbûnek di navbera Îsraîlê û welatên Erebbî de pêk hatiba. Herçend ew nêzîkbûn di asta hewce de nîne, lê eva pêngavên destpêkê ne. Nêzîkbûnek ku dikare dawiyê bi temenê nehs û biyûm ê vê rejîmê di herêmê de bîne.

## Li Efrînê cotkar ji dizî û talankirinê ditirsin

Li gor çavkaniyên xwecihî çekdaran ji gundê Gewanda yê devera Meydana Li herêma Efrînê ya Rojavayê Kurdistanê dest bi qelemkirina rezên cotyarên ku hîn li koçberiyên ne kirine.

Çavkaniyên xwecihî dibêjin her ku mewsîmek li Efrînê dest pê dike, êdî çekdar jî dest bi kampaniya dizî û talankirinê dikin. Li herêma Efrînê ya Rojavayê Kurdistanê, ji salekê ve, her ku mewsîmek ji bo cotyaran dest pê dike, kampaniya dizî û talankirinê jî ji aliyê grûpên çekda ên opozisyona Sûriyê dest pê dike. Herî dawî, grûpên çekdar dest bi kampaniyaya destdanîna ser rezên mîwên tirî kirine. Bi nêzîkbûna biharê re, çekdaran dest bi kesaxa rezan kiriye. Li gor çavkaniyên xwecihî çekdaran ji gundê Gawinda yê devera Meydana dest bi kesaxa rezan kiriye. Li Efrînê, cotyar bi çend qonaxan sûdê ji mîwên Tirî werdigirin. Pelmêwan bi şînkafî difiroşin. Baleta, anku tiriye negihaştî, ji bo doşava tirş difiroşin. Tiriye gihaştî ji bo xwarinê difiroşin. Ji Tirî, doşav, anku dimsê çêdikin. Her ji Tirî sinciqan çêdikin. Herwiha mîwîj û çend şeraniyên din çêdikin.

Ji bilî darên zeytûnan ku mewsîma sereke yê xelkê herêma Efrînê ye, gelk dar û mîweyên din jî hene. Her wekî hinar, gûz, behîv, tirî, simaq û çend cureyên din. Her mîweyek ji wan mewsîma wê di demeke salê de heye.

## Ne tenê 21'ê Şibatê, lê hertim ji bo Kurdan roja zimanê dayîkê ye



Eskender Ce'ferî

Roja 21'ê Şibatê ji Raliyê Neteweyên Yekbûyî (NY) ve weke "Roja Cîhanî a Zimanê Dayîkê" hatiye erêkirin û pejirandin, û di sala 1999'an de ji aliyê UNESCO'yê ve hat erêkirin. Ew roj, di encama xwepêşandinekê de hate destnîşankirin, ku li Pakistanê ji bo zimanê dayîkê ji aliyê ciwanên xwendevan ve hatibû encamdan û di xwepêşandanê de çend ciwan jî hatibûbûne kuştin. Lê ne tenê ev roj, lê belê hertim ji bo Kurdan roja zimanê dayîkê ye.

Ev sedan sal in ku Kurd ji mafê xwendin û nivîsandina bi zimanê xwe bêpar in, ew têne koçberkirin jî, lê dîsa jî zimanê xwe wenda nakin. Kurdên Xurasanê ku di sê qonaxan de wate ji zêdetirî 500 salan beriya niha ve ji Kurdistanê ji bo wir hatine koçberkirin, mîna keke baş in ku nîşan dide Kurd ji zimanê xwe xwedî derdikevin.

Ew hertim rastî hewlên asîmîlekirinê weke qirkirinên siyasî û çandî û zimanî hatine lê dîsa jî ziman û çanda xwe parastine. Herî dawî ew ji beşdarî di şeşemîn festîvala bîranîna Elîşah Xan Heyderîzade helbestvanê Kurd de bêpar bûn. Di festîvalê de nivîskarên Kurd ji Hemedan, Loristan, Urmiye, Sine, Kirmaşan û Îlamê beşdar bibûn. Ev rêgirtin, bînpêkariya yasayên maf û azadiyan e ku li gora wan, her kes bêyî ku ji ber ziman, ol, baweriya siyasî yan



jî neteweyî û yan jî civakî, mal, zayîn an jî rewşeke din, bikare ji hemû maf û azadiyan para xwe hebe.

Ew piranî ji herêmên bakurê Kurdistanê Rojhilat in. Her ji dema desthilata Mannayan ve, ji sedsala 9'an a beriya zayînê ve ew li Kurdistanê xwedî bandor bûn. Di dema çêbûna Împeratoriya Medan de rengê cudahiyan li navçeyê û dîsa jî tevlîbûna hêzan derdikeve, ku Kurdên Kurmanc jî yek ji wan in.

Dem derbas bû û desthilat bû a Şî'eyan. Di salên derdora 1590'î a Zayînê de hewla koçberkirina Kurdan ji Urmiye, Xoy, Makû û Selmasê ji bo Xurasanê dihat dayîn. Ew di salên di navbera 1598'an de heya 1602'an ên Zayînê ji bo Bakurê Xurasanê hatin koçberkirin da ku welatê Farsan biparêzin. Ew koçberkirin di encama civînekê de hat ku di navbera Şah Ebbasê Sefewî û mezînen Kurdan de hate lidarxistin û serokhozên Kurd bi Sefewiyan re li ser koçberkirina wan lihev hatin.

Beriya wê di şerê Çaldiranê de ku di sala 1514'an de çêbû, Kurdistan bibû du perçe. Di hemberî koçberiyê de hatibû misogergirin ku wê mafê wan li Xurasanê parastî be. Ev cara yekemîn nîn e ku

astengî li hemberî çalakiyên Kurdên Xurasanê çê dibin.

Beriya niha jî, wezaretê Çanda Îslamî a Îranê, rê nedabû festîvaleke Kurdên wê navçeyê bê lidarxistin. Festîvala Pîran Çengî ku her sal li bajarê Qûçanê li Bakurê Xurasanê bi rê ve diçû, û tê de hunermendên Kurd ên wê herêmê û bi taybetî kesatiyên naskirî ên mûzîka kevn a wê herêmê beşdar dibûn, sala serbasbûyî pêşî lê hate girtin û îzna birêveçûnê jê re nehat dayîn. Ev di demekê de bû ku ji bo wê festîvalê ji aliyê Kurdên wê herêmê ve xerçeke zêde hatibû mezaxtin.

Ev kiryar jî hemû bingehên Danezana Gerdûnî ya Mafên Mirovan bînpê dike ku li gora wê, mafê çalakiyên welatiyan bêyî liberçavgirtina sîstema dadwerî yan sedemên din ên weke qewmîyet, netewe, dîn yan bawerî, heye.

Lê ne dîrxistinê û ne jî bêparkirina wan ji van çalakiyan, nekariye û nikare zimanê wan ji nav bibe. Weke ku çawan Mihemed Neqî Lutfî nûnerê Elî Xaminêyî li parêzgeha Îlamê a Kurdistanê Rojhilat û pêşnimêjê bajêr dibêje, nabe zimanê Kurdî û nivîsa Kurdî li Îlamê hebe, û divê pêşiya wê yekê were

girtin, li Xurasanê jî heman rewş heye.

Cîgirê parêzgarê Xurasana Bakurî di civînekê de ragihandibû ku dijberên Komara Îslamî dixwazin hesta nasyonalîstî angû hesta netewî di nav xelkê wê parêzgehê de çê bikin. Wî berpîrsê bilind ê Îranî ji saziyên ewlehî xwastibû ji bo bêbandorkirina partiyên Kurdî li wir tevbigerin. Gotinên bi wî rengî hertim rastî nerazîbûna çalakvanan tî, lê di hember de cihê wan çalakvanan dibe girtîgeh.

Ev dujmin, baş dizane ku ziman, hebûna me ye. Komara Îslamî a Îranê bi van kiryarên xwe, benda yekem a Danezana Gerdûnî a Mafên Mirovan bi bêparkirina xelkê ji azadiyan bînpê dike. Ji ber ku standina mafê çalakiyên zimanî û çandî jî beşek ji bînpêkirina azadiyê ye.

Herwisa benda duyem jî ku amaje dike ji ber statuya siyasî, hiqûqî an jî ya navneteweyî di navbera mirovan de cudayî nayê kirin û welatî li cem dewletan divê wehkev bin, bînpê dike. Çimkî li vir maf, tenê ê neteweya serdest e û neteweyên weke Kurd, Erebi, Azerî û Belûçan ji her çalakiyeke wêjeyî, zimanî û çandî bêpar in.



»»» Doma R:6

4. Rewşenbîrên navdar û sernas li dora

Simko

hebûn: Mîrza Ebo Elhesen Seyfulquzat ( 1876-1945 ), Mihemed Turcanîzade, Ehmed Turcanîzade, Ebdulrezaq Bedirxan( 1864-1918 ) û kesekî kêmnaskirî bi navê Mihemed Cemaleddîn Elhekarî ku wekî qazîyê wî yê karên dadwerîyê bû.(2)

5. Ji naveroka rojnameyê tê kifşê ku wan xebat kiriye da ku sistema xwe ya desthilatdarîyê bidin rûniştandin û bêhtir bi gel bidine naskirin. Her weha pê re jî di dijmin û dewletên biyanî re îspat bikin ku ew ne ajawexî, talanker û tevlihevkar in, lê berevajî wê, şoreşa wan xwedî armancên bingehîn, sîyasî û civakî ye.

Di rûpela yekê ya hejmara sisêyan a rojnameya Kurd de, kesek bi navê Mihemed Cemaleddîn Elhekarî bi zaravayê Kurmancî nivîsek belav kiriye. Wî di dawîya nivîsê de weha nivîsiye: “ Qazîyê Simko, Mihemed Cemaleddîn Elhekarî. ”

Li vir, du pirs derdikevin holê: Ew kes kî ye û aya Simko qazîyekî wî hebû ku şewira xwe pê kiriye û ramanên xwe pê re parve kirine ku di pey re jî di nav raya giştî de belav bike? Naveroka nivîsê xwedî hin peyamên sîyasî ye ku armancên serhildana Simko didin xuyanîkirin û ji hêla din ve jî behsa sîyasat û rêbazên çewt ên dewleta Îranê li Kurdistanê dike. Nivîs bi du zimanan û bi awayê jêr (bi Kurmancî û li hember jî bi zimanê Farsî) hatiye belavkirin û ez jî li vir, nivîsê wekî orjînalê wê, lê bi tîpên Latînî dinivîsim û radixim ber çavên we:

“Çar sal e wiqûatê li wan serhedan waqê dibin, bi wasita xezetê(3) xwe bi navê şeqawet(4) îlan dikin(5). Mirovê dût jî çî ko ji heqîqeta şolî(6) bêxeber in, bi wî terzî dizanin, hal ewe heqîqeta şolî ne we ye. Me hêvî heye cerîda(7) Kurdan îro û paş ve rastîya dê şêt(8) wiha binivîsît da xelq heqîqetê bizanit:

Di wê babê(9) da çend xeberan ez dê bêjim:

Bal her kesî meilûm e ku di wê herba umemî(10) da, Îranê bêterefîya xwe îlan kiribû. Hal ewe miletê çî dewletê miharib(11) hindî Kurdêt keftî di serheda Îranê da mutezerzir nebûye(12) û ewe li meydanê ye û her kes bawer neket bilan(ê) bêt bibînît. Ne nifûs, ne mal bo Kurdên feqîr nemaye. Aya ewe ji çî bû? Eger Dewleta Îranê -ku heta xwe metbû(13) wî miletê Kurd ê feqîrkeftî di wî muhîfî(14) dizanî- miharib bû lewra miletê tabîê wî mutezerzir bû. Kanê îlan(a) herb di gel kî dewletê kiriye bila bide zanîn. Hal ewe bêterefîya xwe resmen bi defeatan(15) îlan kiriye, her wekî li nik hemî (kesî) meilûm û miqeyd e.

Eger miharib nebû, miletê tabîê wî çîra hinde mehû û mutezerzir bû. Elbet ewî sebeb heye bilê sebebê wê ewe ye ku Dewleta Îranê muqtedir nebû (ku) miletê tabîê xwe ji pinca(16) ecnebîyan mihafize biket. Dewletê micawirî(17) wî ku miharib bûn, hatine nav milkê wî ehalî û miletê tabîê wî mehû û perîşan kirin. Paş ku du dewletê xarcî ji nav milkê wî paş ve çûn, Îranê dîsa îdara xwe ya zalimane teîsîs kir. Miletê Kurdan fikirî ewe ne careke herçî zemanê yek ecnebî hez ket daxil miklî dibît, miletî mehû diket, kes lê napirsît. Zêde(tir) ji wê û bi rikî û tekalîfê mafoqeltaqet(18) û cirîmê bêqanûn(19) hindî hez diket ji Kurdan distînît, li keyfa xwe mesref diket, ne mektebekê, ne fabrîkekê, ne rêyekê, ne pirekê, ne eczaxanekê, hasilî çu(ti) eserêt medenîyetê bo Kurdan teîsîs naket, çî kesê hez diket bê siwal û cewab dikujît, digirît, ne qanûn, ne şerîet, ne sîyasat çu(ti) destûrekê emel naket(20). Roja lazim jî bît, miletê tabîê xwe nikarî mihafize biket. Belke(î) bi xwe jî hawî(21) ecnebîyan miletê tabîê xwe diherişînît her wekî çar salan ber(î) niha Kurd û Ermenîyê (di nava) milkê Îranê da ku çend esran(22) heta niha wekî biran derbas dikirin, Îranî tehrîk kirin berdane hemû nifûsa Kurdan bi destê Ermenî û Asûrîyan wa mehû kirin. Namûsa Kurdan bi destê Ermenî û Asûrîyan ji nav birin; Ermenî û Aşûrî weke zarokên xweştivî birin nik xwe û ew hembêz kirin. Di destpêka kar de Kurdistan teşwîq û terxîb kirin û gotin: Meger Ekrad Misilman nînin, çîra întiqama xwe ji Asûrî û Ermenan nastînin? Wan ser Kurdan gelek şolêt wiha kirine. Kurdên feqîr ji wê zulmê, ji wê cebirê bêtab man, êdî tehemula wam nema, mecbûr bûn îdia kirin madam Dewleta Îranê neşê me mihafize bikit û ji xeyr(î) zulmê çu(ti-çî) muamilêt dîtir di gel me naket, bilan destê xwe ji me bikêşît em bo xwe dê îdara xwe bikin û milk û cîyê xwe jî dê mihafize bikin. Kurdên feqîr çî ku wasita neşîrê, û mirovê wan li nav meclisa dewletan tinebûn ji bo wê fikira xwe ji xeyr silahî çu wasite(yên) dîtir nedîtin, dest dane silaha xwe, Ecem hêdî hêdî ji nav xwe derxistin, ewên ku mayî jî îşelâh dê dema nêzik da ji eceman tamîz kin. Eceman ew fikire dizanî, sebebê êqdama Kurdan dizanî, belê rastî nedigot(in), digot(in) Kurd şeqawetê dikin, her dem orduyek tertîb dikir, sewq dikire ser Kurdan, belkî Kurdan temamen mehû ket, şocaeta xwe ya fitrî îzhar kirin, (lê) di hemî şeran da xalib bûn. Niha şol gehîştîye derecekê, nêzik e Ecem bo xwe jî mexlûbîyeta xwe(23) û xalibîyet û heqanîyeta Kurdan îqrar ket, eger îqrar neket jî weqayê dê şehadetîyê li heqîqetê bidin, mecala înkariyê namînit. Ew wiqûatê(24) çar sal e di wî muhîfî (de) diqewimît sebeb ew bû ku min erz kir, şeqawet nîne madfa heqî ye(25). Qazîyê Simko-Mihemed Cemaleddîn Elhekarî.”

Para Edebî ya Rojnameya Kurd

Di beşê edebî (wêjeyî) de jî peyamên balkêş hene ku helbesteke mamosta Seyful-Quzat bi awayê jêr hatiye belavkirin:

Qismet Edebî (eser qelemî Axay Seyfu'l-Quzat)

“ Kurdîne, ta key ême le kêwan mîsalî dêw / Bêyn û biçîn û bo me nebê qet xudan û xêw?

Xelkî hemû le bax û le şaran a kêfxoş / Êmeş bilaw û bêserê mawîn le deşt û kêw.

Reşmal e mal û keşk û penîr e meta'î me / Qesr û serayî xelkî dî ye pir le zêr û zêw.

Jêrdestî û îta'etî bêgane ta be key? / Şerm e le bo me, hênde bijîn bînîşan û nêw.

Her mîlletê le la we heqî xoy be deste we / Kurdê ke ser helênê, delên bo te ser bizêw.

Azadî, serbexoyî, mîrî û gewreyî / Dawa biken be zar û ziman û didan û lêw.

Her kes ke pîrr tewawî heqî babî xoy newê / Ew bêbeş e le Kurdî, derî ken, neyate nêw.”(26)

Ew di helbesteke xwe ya din de behsa liderê Şoreşa Kudistanê, Simkoyê Şikak dike û ji gel daxwaz dike ku bihagiranîya wî baş bizane:

“ Kurdan Kurdekan be Xuda rojî xeyret e / Des deyne xenceran û pêyawane bêne lêw.

Simko (Xuda) ke dawe be me sahib û reîs / Şukrî bikeyin bezar û ziban û didan û lêw.

Meqsud(î) wî eme: Ke heq(î) me bidate me / Teklîf(î) meş wiha ye feday bîn be nêr û mêw.”

Di rûpelên din ên rojnameya Kurd de, şiroveya qanûnên hikûmetê hene û bi giştî behsa sistema desthilatdarîyê hatiye ravekirin. Li ser vê mijarê nivîsek bi farsî li jêr nav-nîşanê « meramê ma – Armanca me » hatiye nivîsandin ku bidirêjî û elbete bi zimanekî sade li ser daxwazên xwe yê nêr meşrû nivîsandine.



## Romanek derbarê komkujiya Kurdên Êzidî de hat belavkirin

Romana nivîskarê Kerkûkî Omer Seyîd a derbarê komkujiya Kurdên Êzidî û Enfalê de bi navê “Espere” hat belavkirin.

Romana Omer Seyîd a derbarê komkujiya Kurdên Êzidî û Enfalê de ya herî dawiyê bi navê “Espere” derket.

Omer Seyîd derbarê roman xwe de wiha got: “Mijara romana min, komkujiyên li hemberî Kurdan e. Enfal û komkujiya DAIŞê li dijî Êzidiyan pêk aniye jî mijarên vê romanê ne.

Nivîskarê Kurd diyar kir ku di romana wî de qurbanî behsa bûyerên jiyana xwe dikin û wiha axivî: “Qurbanîyên Enfalê û jin û mêrên Şengal, Koço û gundê Kuleco yê Germiyanê behsa serpihatiyên xwe dikin. Qurbanî di nav dinyayekî xeyalî û dadgeheke mejûyî de di rihê spî yên jinan de celadên xwe dikin nav qefesa dadgehê û hemû mejiyê dagirkerî û komkujiyê rûreş û şermezar dikin.”

Omer Seyîd di sala 1970'î de li bajarê Kerkûkê yê Başûrê Kurdistanê ji dayîk bûye û dibistana serateyî û amadehiyê li Çemçemalê qedandiyê. Pêştir karên wek şanogerî û nîgarkeşiyê kiriye. Di warê şanogerî, nîgarkeşî û çîrok nivîsandinê de çend xelat wergirtine.

Seyîd berî vê romana xwe ya dawiyê li ser heman mijarê du romanên bi navên “Bazne Raxrewekani Babil” û “Serzemini Zikzike” nivîsandine. Rudaw



### »»»» Doma R:9

Emiliano Zapata û Simkoyê Şikak

Emiliano Zapata (1879-1919) şoreşgerekî Meksîkayî bû. Ew gundîyekî Çermisor bû ku li dijî kedxwarîya feodal û hakimên herêma xwe serkêşîya şoreşekê kiribû. Karkerên gundî yên di kargehan de bi rêxistin kirin û di destpêka serîhildana xwe de ji sê parên axa welêt parek rizgar kir. Di pişt re ji hemû axa Meksîkayê, hemû başûrê welêt bi dest xist. Lêbelê serokomarê wê demê yê bi navê Carranza xwest reforma zevî û axê ya ku E. Zapata dabû destpêkirin rawestîne û bi kompoyekê bi merema hevdiîtinên sîyasî ew lehengê xizmetkarê berjewendîyên gel, kuşt. Zapata dema ku ji aliyê hêzên dewletê ve li cihekî bi navê Cuernavacayê hate kuştin, 39 salî bû.

Xala balkêş ew e ku di awayê kuştina Zapata û Simko de wekhevî pir in. Her du jî şoreşger û di dema hevdiîtinên sîyasî tene kuştin. Yek rêberê Şoreşa Meksîkayê û yê din jî serokê Şoreşa Kurdistanê ye. Dijberên her duyan jî diktator û mirovên vîrek û sextekar bûn ku pişt wan ne bi hêza gel, belkî hêzdarên kedxwar bûn. Her du jî di dîroka welat û gelê xwe de wekî “qehremanên milî”, xwedî navekî xweş in. Li pey şehîdbûna her du lîderan,

ji hêla gel ve gelek stran û helbest hatine gotin û nivîsandin, lê bi qasî ku li ser Zapata filmên sînemayê, konferans û semînar hatine çêkirin û lidarxistin, mixanin li ser Simko xebatên weha kêma in. Dema Simko tê şehîdxistin, helbesta jêr li her derê dikeve ser zarê xelkê:

“ Rijandî namerd xwênî merdanit / Tolet estênît lawî Kurdanit.”

Di folklorê Kurdî de, nêzî 20 stranên ji hêla dengbêj û hunermendên Kurd ve li ser Simko û endamên din ên malbata wî hatine gotin. Kawîs Axa, Şakiro, Hecî Ebdulkerîm, Kazo û Şehram

Dostanî hinek ji wan kesan in ku bi peyvên xweş li ser jîyan, qehremanî û şerê mîrxasên Kurd, kilamên xweş gotine. Di kilamên dengbêjên me de, li ser zilim û zora serdestan û hejarî û liberxwedana bindestan, bi zelalî behsa gelek rûdanên nexweş tê dikin.

Jêder û Têbînî

- (1). Wateya wê ayetê weha ye: “Û hûn tev lepên xwe biavêjin benê Xwedê û ji hev belav nebin.”
- (2). Lêkolîna min a li ser jîyan û kesayetîya wî heye lê hîn bi dawî nebûye. Bes a girîng ew ji Colemêrgê bû û kesekî pir zana û şoreşger bû. Dema dibîne ku Rojhilatê Kurdistanê azad dibe, xwe digihîne cem Simko û wekî qazîyê wî pê re kar dike.
- (3). Rojnameyên
- (4). Tevlihevkar, têkder.
- (5). Belav dikin, diweşînin.
- (6). Ji rastîya kar û şixul.
- (7). Rojname.
- (8). Dikare.
- (9). Di vê derbarê de, li ser vê mijarê.
- (10). Yanî di dema Şerê Cîhanê yê Yekem de (1914-1918).
- (11). Dewletên şerker, dewletên di halê şer de.
- (12). Rastî xisar û zîyanê nehatiye.
- (13). Girêdayî.
- (14). Cih, herêm.
- (15). Bi caran. Çendîn caran.
- (16). Ji destê.
- (17). Dewletên cîran.
- (18). Li derveyî sînorê hêza wan.
- (19). Cezayên li derveyî qanûnê.
- (20). Cî bi cî nake.
- (21). Wekî, mîna, bi awayê.
- (22). Çend qirnan, çend sedsalan.
- (23). Şikestin û binketina xwe.
- (24). Bûyer, rûdan.
- (25). Parastina maf û emekê ye.
- (26). Ew helbest di nava Kurdan de naskirî ye û xwedî peyamên civakî û sîyasî ye ku rewşa Kurdan a serdema Qacarî û Riza Pehlewî bi eşkeretî dide xuyanîkirin. Mamosta Seyful-Quzat, bi zimanekî wêjeyî û xweş, gilî û gazinên xwe ji dagirkerên welatê xwe vedibêje.

## Zimanê Kurdî

3- Li pey navan : - Sosin keça kê ye ? - Em ê herin mala kê ? - Ev zarokên kê ne ? 4- Li pey pêrbestan : - Alan bi kê re çû malê ? - Te ev pêûs ji kê kirriye ?

5- Li pey hevalkaran (hokeran) : - Tu nêzî kê yî ? - Tu dûrî kê yî ? - Berika te li ber kê ketibû ?

Çend mînakên hînkê : - Te kî şandiye dibistanê ? - Kê te fêrî zimên kiriye ? - Kî kê fêrî xwendinê dike ? - Kê kî fêrî xwendinê kiriye ? - Kî ji kê re kar dike ? - Kê diyariyek daye kê ?

Têbînî : Gelek caran cînavên pirsiyarî (kî, kê) ji raweya pirsiyariyê der diçin û wekî cînavên kesîn bikar tên: Wek : - Tu kî bî û tu lawê kê bî jî, ez ji te natirsim. - Kê tu şandibî û kî li pey te be jî, ez bi te re

naçim.

“Kû” (ku) :

Cînavê “kû” yan jî “ku” cînavê pirsiyarî ye. Tenê bo pirsê cihê mirov, giyanber û tiştan bikar tê. Anku, bo zelalkirina cihê navên berpîrs tenê tê xebitandin. Wek : - Tu ji kû yî, tu diçî kû ? (Ez ji Amûdê me, diçim Nisêbînê) - Pezê Reşo li kû ye ? (Pezê Reşo li pirêzê ye) - Mala we li kû ye ? (Mala me li Amûdê ye). Li gora parvekirina bêjeyên hevokê, ev cînavê pirsiyarî di rêxistina hevokan de dibin :

1- kara (kiryar) : - kû şewitiye ? - kû xweş bûye, em lê rûnin ?

2- Berkarê rasteder : - Tu kû dixwazî ? - Te ji zeviya xwe, kû firotiye ?

3- Berkarê nerasteder : - Em ê herin kû ? - Ava kû xweştir e ? - Nuho em li kû ne ?

4- Rewşa salixî : - Ev havîngeh kû ye ? - Ew devera han kû ye ? Car caran cînavê pirsiyarî “kû” ji tîgeha pirsiyariyê tê der û weku cînavên dîtir (bêyî pirsiyar) bikar tê . Wek : - Tu ji kû bî, ez ji kû bim nexem e, em

heval in.

- Hûn ji kû hatibin, biçin kû, herî hûn mêvanên me ne. - Em li kû bûn, li kû mabûn; nepirse, va em hatin .

Di van mînakên de, cînavê pirsiyarî “kû” ne bi mebesta pirsê bikar hatiye û wateya pirsiyariyê jî bi xwe ve nagire. Tenê weku cînavê li şûna navên cih û deveran bikar hatiye.

“Ka” (Kanî) :

Digel ku cînavê “ka” di zimanê kurdî (KJ) de bi şeweyekî rojane bikar tê jî, lê tu kesî ji rêzimanzanên Kurdan ev cînav di ber çavên xwe re derbas nekiriye. Tenê Seyda Sadiq Behadînê Amîdî, bi kurtî ew destnîşan kiriye : ( ) “Ev cînavê pirsiyarê cihê tîbînê kesî, mirov, canewer yan tiştî pîrs diket, divêt bizanît...”. Li dawî dibêje, ez bawer dikim ku ev “ka” tîgeheke firehtir bi xwe ve digre û çend mînakên berçav dike. Li gora dîtina min, bêjeya “ka” di (KJ) de bêjeyêke neguhêrbar e. Anku, bo her dû zayendên nêr û mê, yê yekjimar û komjimar tê xebitandin, bêyî ku ruxsara (forma) wê bê guherîn : - Ka birayê te ? - Ka hevala te ? - Ka dostên te ?

Car caran jî li şûna “ka” yê “kanî” bilêv dibe : - Kanî dostê me ? - Kanî ew bax û bîstan ?! Ji hêla tîgeha û wateyê ve jî bêjeya “ka” bi dû coran tê xebitandin : - Cînavê pirsiyariyê . - Alava agadariyê .

a-”Ka”, weku cînavê pirsiyarî, bo zelalkirina çend tîgehan bikar tê :

1- Bo nasîna cihê mirovekî, canewerekî yan tiştêkî tê xebitandin : - Ka (kanî) mêvanê me ? (Mêvanê we li gund e) -Ka ew bilbilê ku li ser darê bû ? (Ez nizanim bilbil li kû maye) -Ka mala Reşo, li kû ye ? (Mala Reşo li Dêrika Mazî ye) Di van mînakên de, me cînavê pirsiyarî “ka”, bo zanîna cihê lîbûna van navên berpîrs (mêvan, bilbil, mal) bikar aniye.

2- Bo zanîna rewş û heyîna navên berpîrs bikar

tê :

- Ka bavê te, ne xuya ye ? (Bavê min-tu xweş-çû dilovaniya xwedê) -Te dirav girtin, ka deynê min? (dirav neman, deynê te jî, bila bimîne demeke dî). - Ka mastê çêleka Fatê ? ( Mast nîne, Fatê çêleka xwe firot).

Di van mînakên de, em bi “ka” yê pirsê rewş û hebûna navên (bav, deyn, mast) dikin, ne ku em dixwazin bizanin, ew li çî cihê ne.

3- Gelek caran jî, ev cînav ji rojeva pirsiyariyê dûr dikeve û ji bo derbirîna hestekî derûnî, wek mixabiniyekê, keserberdanekê, bikar tê : - Ka ew keç û xort, ew dost û heval ?! - Ka ew rojên xweş, ew cejn û sersal ?! yekser li me çûn, bûn xewn û xeyal...!!

**Dom heye...**

## Ji ber weşana "TISHKTV", Kurdên Rojhilata Kurdistanê keyfxweşiya xwe nîşan dan

**X**elkê Kurdistanê Rojhilat di gund û bajarên de, piştî xwê ku televîzyona "TISHK" li ser setelaytê dest bi weşana xwe kir, keyfxweşiya xwe nîşan dan.

Xelkê azadîxwaz û nîştimanperwer yê Kurdistanê, endam û alîgirên PDKÎ, li bajarên Îran û Kurdistanê, piştî bihîstina nûçeya weşana bernameyên "Tishktv" li ser setelaytê, bi awayên cuda keyfxweşiya xwe nîşan dan.

Xelkê nîştimanperwer yê Kurdistanê, bi belavkirina sirûda neteweyî ya "Ey Reqîb", û "hildana axabaniyan", û karên din yê bi wî rengî, tevî nîşandana keyfxweşiyê, pîrozbahî jî yektir kirin.

Hevdem xelkê azadîxwaz yê Kurdistan û xebatkarên Demokrat, tevî pîrozbahîkirina li malbatên serbilind yê şehîdan, peymana emegnasiyê digel rêbaza şehîdan û malbatên şehîdan nûkirin, ku heya bidestveanîna armancên şehîdan dev ji xebatê bernadin.

Di heyamên bê de, televîzyona "Tishk" wê weşana bernameyên xwe li ser setelayta Yasasat dest pê bike.



## Navê zarokê Kurd, Alan Kurdî li keştiyeka Almanî hate kirin

**B**i merasîmeke fermî li grava "Mallorca" ya "Spanî" navê keştiyeka Almanî bû Alan Kurdî.

Ew keştî taybete bi rizgarkirina koçberan jî nav deryayê ye.

Rêxistina bi navê Çavê Deryayê ya Almanî wî karî bi rê ve dibe.

Rêxistina Çavê Deryayê, rêxistineke Elmanî ye û heta niha 14 hezar kes jî nav deryayê rizgar kirine, û ji aliyê jin û zilamekî ve hatiye avakirin.

Di merasîmê de, bav û meta Alan Kurdî jî beşdar bûn. Bavê Alan, Ebdula Kurdî ragihand, ew kêfxweş in ku navê kurê wî li keştiya Almanî tê kirin û got, divê ti carî dîmenên cenazeyê Alan li peravê neyê jibîrkirin.

Di meha 9 sala 2015 ,Alan Kurdî ligel dayîk û biryarekî xwe di dema ku xwestin biçin Ewropayê xeniqî û cenazeyê wî li peravên Bodromê hate dîtin.

